

ARJEN ARÎ

RAMÛSAN MIN VEŞARTIN LI GELIYEKİ



**RAMÛSAN MIN VEŞARTIN LI GELIYEKİ
ARJEN ARÎ**

WEŞANÊN AZAD
Helbest: 02/05

Editor
Eslıhan YILDIRIM

Redaksiyon, Berg û Rûpelsazi
J&J

Çapa Duyemîn
Weşanê Azad, 2013

Çapxane
İMAJ MATBAACILIK SAN. TİC. LTD. ŞTİ.
Litros Yolu, 2. Matbaacilar Sitesi, C Blok 2 BC 6
Topkapı / İstanbul
Tel: 00 90 212 501 91 40
Sertifika No: 26954

ISBN: 978-0-9575612-4-3
Company No: 8291088

Navnîşan
WEŞANXANEYA AZAD
41 Handa Walk
LONDON
N1 2RF
www.wesanxaneyaazad.com
info@wesanenazad.com

© Mafê wê parastî ye. Ji bili danasînê bêyi destûra weşanxaneyê û malbata
nivîskar bi tu awayî nayê kopikirin û nayê belavkirin.

ARJEN ARÎ

RAMÛSAN MIN VEŞARTIN LI GELIYEKİ

HELBEST

NAVEROK

| | |
|---|----|
| PÊŞGOTIN | 7 |
| BERHEMÊN ARJEN ARÎ..... | 15 |
| JÎNENÎGARÎ..... | 21 |
| HERAKOL..... | 23 |
| ÇARÎN..... | 25 |
| MASÎKO | 26 |
| KURIK..... | 27 |
| TU SIMBÊLAN BADE..... | 28 |
| ÇARÎN..... | 29 |
| NAME..... | 30 |
| NE AXPEREST IM..... | 32 |
| KULÎLKÎN BIHARA DERENGMAYÎ..... | 35 |
| EV SIMBÊL..... | 37 |
| BERF Û XOPANÎ | 38 |
| BANG | 39 |
| EZ Û DIL, ÊVARÎ..... | 40 |
| SIBAT E, BÊHEDAR IM..... | 42 |
| ÇARÎN..... | 43 |
| ÇARÎN..... | 44 |
| TOVREŞÎN IM..... | 45 |
| KUTIK GOŞTÊ ŞIMA NÊWENO..... | 47 |
| LI SER HELEBÇE | 49 |
| DÊRSIM DÊRSIM | 50 |
| ÇALÊ Û ÇAR ÇARÎN | 51 |
| PIÇEK MERHAMET | 52 |
| KÎ YE XWEDIYÊ VAN WARGEH Û VÎ WELATÎ..... | 53 |
| ŞEVEKE HAVÎNÎ STÊRK... Û WELATÊ MIN..... | 56 |
| ZAROKÎN ZERDEŞT | 58 |
| KARIBÎ WER VEMIRÎN!..... | 59 |
| BAZARA MIN Û KELEŞKOFÊ..... | 60 |
| SIBAT E..... | 61 |
| RAMÛSAN MIN VEŞARTIN LI GELIYEKİ..... | 63 |

| | |
|--|-----|
| MIHEMEDO..... | 66 |
| KOÇERÊ..... | 68 |
| KIRÎVÊ KÊVO..... | 70 |
| PIRS HENE ZANIM..... | 72 |
| BI ZERIYEKÊ RE BAZAR..... | 74 |
| DU DAREŞ | 75 |
| JI BÎR NEBÛBE..... | 76 |
| TAA FERWERDÎNEK DIN | 77 |
| MEGRÎ | 78 |
| DAWETA ME BÛBA VÊ BIHARÊ LI VAN ERDA..... | 79 |
| XWERÛ BIHAREK E SERHILDANA ÊŞA MIN | 81 |
| NOŞİN BE..... | 83 |
| MIRINÊ, TU BI XÊR BÊ!..... | 84 |
| HÊ ŞER E LI WÎ MILÎ..... | 85 |
| LI SER XEWNEKÊ..... | 86 |
| AXA MIN | 87 |
| WEY GIDÎ..... | 88 |
| ÇARÎNÊN HEWADÊR..... | 89 |
| SIBE NEWROZ E | 90 |
| JI ÇAPEMENIYÊ ÇEND RÛPELÊN LI SER ARJEN ARÎ. | 91 |
| HÊVÎ HAWAR Û NASNAMEYA XAKEKÊ: ŞERGELE... | 93 |
| EM JI TE HEZ DIKIN ARJEN ARÎ..... | 98 |
| NIVÎSER ÇIRAYÊN HILIN NAVEMIRIN..... | 99 |
| SILAV LI TE BIN ÇIYAYÊ RÛ SPÎ ARJENO | 101 |

PÊŞGOTIN

Arjen Arî, kirî salek wî biqede ku ji nav me koç kiriye, lê hey di bîra me û di dilê me de ye.

Arjen Arî, şairê modern ê bakûrê Kurdistanê, cwamêr, ji xwe heskirî, rûgeş, welatparêz, bargiran... Wek ku em tev de zanin, ji ber rewşa civata me kesê wek Arî pir kêm digihin û windakirina wan valahiyek mezin çêdike. Ji xwe dema ku ê wek wî û Mehmed Ûzûn wilo zû û diltijeyî berhema koç dikin birîn hîn bêhtir xedar dibe. Dema di 30ê Kewçêra 2012'an de çû rehmetê, Arjen Arî hîn 56 salî bû û gelek projeyê ku dabûn ber xwe bi xwe re birin.

Dema pismamê min Arjen Arî tê bîra min hem ez pir dilxwes dibim, hem jî pir xemgîn. Di windakirina wî de min dîsa hîs kir ku di hin rewşa de insan gelekî bêçare ye, tu ci dikî bike vegera wî tune ye; lê dema di jîyan û hebûna wî de difikirim ez pir kêfxwes dibim û dibêjim, xuyaye digel hemû zehmetiyan insan kare jîyanek pir bi rûmet ava bike.

Wek nivîskarek ji Nisêbîn min dixwest ez arşîveke navdarê Nisêbînê çekim. Min ev dilxwaziya xwe ji Arjen Arî re jî got. Rojekê em li Amed li mala wan li hev rûniştin, hebekî behsa jiyana xwe û xebatê xwe ji me re kir û çend helbestê xwe xwendin. Min ew di kamera de qeyd kirin û xist arşîva Nisêbînê. Sohbetek germ û ji dil bû. Geh hin 'henek li me kirin, geh behsa kulê xwe kir. Yanî ne hevpeyvînek klasîk û fermî bû. Ji

xwe Arjen Arî her devliken û xweşsohbet bû. Em ê pir û pir bêriya wî bikin.

Dema ji bo bîranîna wî di salvegera vefata wî de me xwest em berhemeke wî amade bikin, min ew hevpeyvîn ji nû ve di ber çava re derbas kir. Wexta min lê guhdar kir min ji xwe re got, ew di hemû warî de şêrgele bû ne tenê di warê wêjeyê de. Jiyana wî tev de bi berxwedanek birûmet derbas bûye û tu tişt çavê wî netirsandiye, hey ew bi dû rastiya xwe de meşiyaye ‘heya nefesa xwe ya dawî. Eşkera ye ku her tim bi astengiyan re rû bi rû bû, loma pir zû ji nav me bar kir. Niha ji wê sohbetê ez ê hin vegotinên Arjen Arî yê di derbarê jiyana wî de bi we re par ve bikim:

“Ez di sala 1956'a li herêma Omeriya, li gundê Çalê çêbûme. Dûra me mala xwe ankiye Nisêbîn û li wir min dest bi mektebê kir. Min salekê li Nisêbîn mekteba navînê xwend, dû re bi mebesta xwendinek baştir malbata min ez şandim Mêrdînê û li wir min dibistana navînê xelas kir. Lê ez dîsa vege riymam Nisêbîn. Ez ne şaş bim 1971'ê de li Nisêbînê lise vebû, em nifşê ewil in, min lîsê li wir xelas kir.

Piştî lîsê min û çend hevala biryar da ku em herin Ewrûpa. Wek xortê welatparêz wî wextî me digot em ê herin perwerdeyek bedew bibînin da ku em li welatê xwe vege rin û xizmetên baştir bikin. Şerefxan Cizîrî wê demê 2-3 meha li benda min ma ji bo em tev de herin Swêdê. Musa Anter mektûbek dida yêñ ku diçûn, zarokê wî li wir bûn alîkarî bi wan xorta re dikirin. Me ji xorta re bi dahol û zirne, bi tembûrê

şahî çêdikir û ew bi rê dikirin, yanî wê demê xortên ku diçûn Ewrûpa wek xortekî Kurdan ku here û ji bo welatê xwe tiştên baş bike diçûn. Dilê xorta tev dibijya ku herin, ew qasî îdealîze bûbû. Wê demê bêrika herkesî yê ê din bû. Dewlemendiya kesan bi dewlemendiya cihatê ve girêdayî bû. Ne wek niha bû, niha tekakesibûn li pêş e. Di xortaniya me de dewlemendiya yekî dewlemendiya yê din bû, bi demê re hêdi hêdi ev hat guhertin.

1974, min bi Tirkî dest bi helbestê kir. Yek helbestê meyla min bir ser helbestvaniyê, ew jî helbesta Anayasso ya Şemsî Bellî bû. Di rojnameyekê de min xwend û pê de ez ber bi helbestê ve çûm. Loma helbestên min ên ewil, di şêwaza Şemsî Bellî de bûn. Bi navê “Hammal” helbestek min nivîsibû, ez dibêm hema ne kêmî Anayasso bû. Di 1976'an de li Nisêbînê min û hin hevalan belavokek li ser salvegera darvekirina Deniz Gezmiş belav kir. Salvegerek bi derengî bû, ne tam di wextê wê de bû; ji ber ku me nikarîbû di wan rojan de çalakiya bikin. Li ser wan belavokan ez hatim girtin. Dema ez hatim girtin helbestên min jî tev birin û nema dan min. Nêzîkî deh roja ez girtî mam û ez berdam. Dûra rojekê ez çûm min doza helbestê xwe kir, ji min re gotin; ku tu nexwazî li ba wan bî careke din li wan nepirse! Niha ew helbestên wê demê qet li cem min tunene. Piraniya wan bi Tirkî bûn, wê demê tenê 3-4 heb bi Kurmancî bûn.

Min di sala 1979'an de Enstîtuya Perwerdeyî ya Diyarbekirê Beşa Zimanê Tirkî qedand. Min mamosteyî nekir, bi teşwîqa dostekî ez bûm memûr li DSlyê. Tenê demeke kin di ber memûrtiya xwe re min mamostetiya dersa edebiyatê li liseya Nisêbînê kir.

Sala 1979'an li Nisêbînê qaçaxçıyan çend esker û serbazek kuştibûn, îca eskeriyê 2-3 rojan Nisêbîn kîrin qelaqê, kes nema ku negirtin; xelk ji ser limêjê dibirin... Min li ser wê rewşê helbestek nivîsîbû. Ji bo vê rewşa zilmdar tevgera siyasî DDKD wê demê belavokek bela kir. Ez jî di rêxistina DDKDê de bûm. Belavok bi wê helbesta min ya bi Kurmancî dest pê dikir. Em sosyalist bûn, loma mijara helbestên me sosyal bûn, rewşa xelkê me yê feqîr bûn... Dema derbeya leşkeri (12 İlîn 1980) ew helbestê wê demê jî çûn, ew jî niha li ba min tunene; carê wek ku talanê min ji min dihat stendin.

Berî ez bêm birîndarkirin, sala 1992'yan bû ez bi mîvandarî hatim Amed û min bi navê "Gulîkêñ Buhara Derengmayî" kitêbek helbesta amade kir ji bo çap bibe. Lê kesê ku min dosya spartibûyê ew winda kir. Helbest li cem min tunebûn, loma ew ez zêde eşandim. Ji ber jî min nizanîbû, nedihatîn bîra min. Zêdeyi salekê, min nema helbest nivîsîn, hingî ez aciz bibûm. Şevekê ez ji xew veciniqîm, min nerî ku 3-4 helbestê min têñ bîra min. Wê şevê ez rabûm min ew nivîsîn û bi wî hawî ez dîsa li helbestê vege riymam.

Di sala 1992'yan de li Nisêbinê li ba mala min ketin kemîna min, xwestin min bikujin; ez birîndar kirim. 28ê meha 12an bû. Li herêmê salên 1990'î hûn mesela Hizbûllah û kuştina welatparêzan zanin. Î min jî wê rojê mîvanek min di tenișta min de ye, ez texsiyê diajom û em diherin malê. Çile ye lê dinya xweş e, ne baran e û ne şılı ye. Li serê sikaka mala me pîrekek kir ku derbasî wî alî sikakê bibe, ez mam sekinî heya derbas bû. Min dît 2 heb li ber direka ceyranê sekinîne, yek zerik bû, yek jî esmer bû. Ji ber rewşa herêmê hayê min ji min heye û wek gelek kesan her tim ez bi tedbir bûm. Rewş ew qas xerab bû. Her roj dema ez ji mal derdiketim, yan dema ez dihatim mal min bi destê çepê erebe diajot û bi destê din ez bi tedbir bûm. Lê wê rojê ez vala me. Tu nabê ew her du kes ketine kemîna min, min ew derbas kirin ne kirin ê esmer bi serê xwe işaret da yê bozik. Her du jî montê çerm li wan bûn. Dema serê xwe hejand min dît, destê xwe avêtin newqa xwe, demançen xwe derxistin û li me reşandin. Min ji ê kîleka xwe re got; serê xwe bitewîne!

Ji mala me re 100 metrok nemaye. Heya ber mala me fişek nesekinîn, camên erebê yên kîlekan û ya dawî şkestin. Cama pêşiyê jî fişek lê ketiye şikestiye, bûye wek cama bibûz ez nema ber xwe dibînim. Hem derb li min dikevin, hem ez xwe ditewînim û erebê diajom, hem ez ê tenișta xwe dihimînim. Xanima min jî li dengê sîlehan derdikeve dinêre ku ez im, dike qêrîn, dike hewar; du derb avêtin wê jî. Koncalek biçûk wek cokê li sikakê hebû dema tekelê

erebê ketin wir cama pêsiyê hat xwar û min ji nû ve ber xwe dît. Ya rastî xanima min ez xelas kirim, heyâ bi wê daketin ez bi ser hişê xwe hatim û min erebe ji fitêza yekê derbasî 2'yan û 3'yan kir û min gaz da erebê.

Îca yek ketiye vî alî sikakê û ê din ketiye aliyê din; çep û rast li min girê dane. Bi dû min de jî çend fîşekên din avêtin, xwestine li depoya benzînê bixin, lê li xilqê ketibû. Ez dageriyam sikaka din û îca ez sekinîm. Tirsa wan jî tunebû ji xwe ber êvarê bû û pêş çavê xelkê ‘hema ew qas dem bi min daketin, derb avêtin xanima min jî. Mêrika profesyonel bûn, ji kuştinê re li min direşandin, montê li min kiribûn serad. Lê tenê 4 fîşek li min ketibûn. Birînek jê, ya pişta min xedar bû. Di wê navê re hinekan ji min pîrsî got, ma tu derb li te ketine? Min got, avek germ bi min de diherike, erê ez dibêm derbek li min ketiye.

Ez mam sekinî min got; ez dakevim ez destvala me, ma ez karim çi bikim, xerabtir e. Ez daneketim, piştî kîlîkekê ku ez di xwe fikirîm, bi wê birîndariyê û bi wê texsiya ku camê wê hatine xwar min berê xwe da nexweşxaneyê.

Piştî ez rehet bûm, min mala xwe anî Amedê. Ji wî wextî de mala min li Amedê ye.

Li Amedê jî wek memûr ez xebitîm, sala 2002'yan ez teqawîd bûm. 4 zarokên min hene; 2 keç û 2 law. Wek daxwaza dil, min dixwest xaniyekî min yê bi

kevirê neqîsandî li Mêrdînê heba, raserî beriyê, ku dema tu di şibakê re binerî tu wan der û doran tev de bibîne.

Heke em bêñ ser helbest û kitêbên min ên çapbûyî; wek kovar helbesta min ewil di sala 1979'an de di kovara Tirêj de hat çapkîrin. Piştî derbeya leşkerî min helbestên xwe dişand Swêdê, di kovarêñ weke Berbang, Kurdistan Pres, Nûdem û Çira de dihatin weşandin. Li Tirkîyê jî di kovarêñ wekî Rewşen, Nûbihar, Gulistan, Kevan, Tiroj, W de û li Herêma Başûrê Kurdistanê di kovarêñ wekî Peyv, Nûbûn, Karwan de helbest û nivîsêñ min hatin belavkirin.

Kitêba min a pêşî di 2000'i de hat çapkîrin. Her 3 kitêbên min yên ewil bi dû hev de yek xebat in. Ez helbesta wek romannivîsa dinivîsim. Ez projeya datînim ber xwe û li wê gorê dinivîsim. "Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî", "Ev Çiya Rûspî Ne" û "Şergele" her sê xebat di zik hev de ne, hevdu dişopînin. Mijara wan berxwedan û şerê 20-30 salêñ dawî ne. Bi min her sê xebat dewama hev in, yek bêyî yekê kêm e, hevdu temam dikin. Yanî kesekî ku bixwaze tamekê ji helbesta Arjen Arî bike divê li her sêyan binêre. Şopa 'Ev Çiya Rûspî Ne' di 'Şergele' de heye, şopê Şergele di 'Ev Çiya Rûspî Ne' de heye, şopa 'Ev Çiya Rûspî Ne' di 'Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî' de hene. Ji ber ku mijara hemûyan erdnîgarî û xelkê Kurdistanê ye, jiyana Kurdistanê ye.

'Eurotîka' xebatek bi serê xwe ye; mijara wê bi gelempêrî hez e. Ne Ehmedê Xanî bûya belkî min ev kitêb nenivîsandiba. Min hin malikê Ehmedê Xanî yê di derbarê hezê de li mala xwe daliqandine. Hez gelek tiştan di hundirê xwe de vedihewine. Ji ber şerê di welatê me de, di civatê de hez hinekî li paş ma, em ji gelek hezkirinan bêbehr man. Loma min xwest ez hezê ji nû ve li ber însanan raxim, têxim rojeva Kurdan. Ez difikirim ku hezkirin di civatê de çi qas bi pêş bikeve, ew qas welat jî wê bi pêş bikeve. Ez çi qas ji hevala xwe hez bikim, ez çi qasî ji gundekî, ji darekê, ji kulilkekê hez bikim ew qasî ez ê ji welatê xwe hez bikim û pê ve girêdayî bim. Hez ne yek tişt e, gelek tişt e. Dema tu wan tev de bidî hev, bînî cem hev welitekî pir xweş derdikeve holê.

'Çil Çarîn' xebatek bi serê xwe ye. Di çarînan de min şairên berî xwe bibîr anîne, wek Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran. 'Destana Kawa' jî xebatek bi serê xwe ye. Hîn ez li Nisêbinê bûm ev wek projeyekê di serê min de hebû. Salêن 1991-92 bû, min digot ez ê "Destana Kawa" binivîsim. Min ev bi şêvazeke din nivîsiye. Dema min ev nivîsî min ji çend tiştan sûd wergirtin, min ew spart du sê tiştên ku di nav civakê de heye. Bi şêweyekê klasîkî hatiye nivîsandin, tama çirokbêjiya Kurdî tê de heye, bêhna dengbêjiyê jê tê û dawiya dawî mesnewî ye.

Pir bi zehmetî ez bi ser şêvaza Arjen Arî vebûm. Min gelek tişt ceribandin, ez bi gelek rîyan de çûm heyâ ez bi ser vebûm. Ez li xwe mikur werim, min zêde

giringî neda ìmajê; ez neketim dû peyvên ku qet bi kar nehatibin, wexta bêñ gotin bibiriqin bikin ku beledî vedin di mejiyê xwendevan de. Min qet guh neda vê. Min xwest helbestên min sade bin, herikbar û sivik bin, xwendevanê xwe neêşîne, xwendevan her bixwîne hê bêhtir lê sor bibe. Ez çi qas giham vê armancê ez nizanim, gerek xwendevan wêna bêjin.”

BERHEMÊN ARJEN ARÎ

1. Ramûsan Min Veşartin Li Geliyekî, Weşanên Avesta, Helbest, 1999
2. Ev Çiya Rûspî Ne, Weşanên Avesta, Helbest, 2002
3. Destana Kawa, Weşanên Elma, Helbest, 2003, Çapa Duwem, Evrensel Basim Yayın, Stenbol, 2011
4. Eroûtîka, Weşanên Lîs, Helbest, 2006
5. Bakûrê Helbestê / Antolojiya Helbesta Bakûr, Weşanên Yekîtiya Nivîskarêñ Kurd-Duhok, Antoloji, 2008, Çapa Duwem: Evrensel Basim Yayın, Stenbol, 2012
6. Şêrgele, Weşanên Avesta, Helbest, 2008
7. Cil Çarîn, Weşanên Enstituya Kurdi Ya Amedê, Helbest, 2009
8. Bihoka Li Pişt Sînor, Avesta, Çîrok, 2010
9. Payîza Peyvê, Weşanên Belkî, Amed, Helbest, 2011
10. Kulîlkêñ Be'ivan, Weşanên Ronahî, Amed, Helbest, 2012
11. Gorî Û Bindest, Weşanên Ronahî, Amed, Helbest, 2012

12. Xame Sihurî Kaxiz Şiyar Ma, Weşanê Ronahî, Amed, Helbest, 2013
13. Xasenezer, Evrensel Basim Yayın, Hêçan, 2013

**Gerînendeya Weşanê Azad
Eslîxan YILDIRIM**

“geya di bin tehtan de namîne”

**RAMÛSAN MIN VEŞARTIN
LI GELIYEKÎ**

JÎNENÎGARÎ

Ji herêma Omeriya, yekî Çalî
digel ku diya min dibêje
"...dema miştanaxan bû..."
di nasnameyê de rojbûn 01.04.1956 e
min du qîz hene û du kur, ma ne bes e
bîst sal e
derwêşê tekiya helbestê me!...
el qise;
ne pênc carêن binçavkirinê
ne jî di sikaka wî bajarî de
birîndariya birayê mirinê
bû
sedema ku vî welatî bihêlim
û biçim...
li dû bûyerekê hê jî diniçniçim

ax xuşkê
kûçik nedan xatirê xwedî?!

992 de min rûyê jar yê Amedê dî
hûn bibêjin nişteci
ez bibêjim penaberî heft sal e didome
qirika bi qul
 axa bindest
 jana dil
 helbest...
min hij binefşê kir li dû çavên yekê!
û min temenek li ser nekir
geh ez westiyam, geh ew
geh bû rastiyek geh bû leyhana derew
sox î helbest e ew!
û ez li pey şairî evdal im
merivno
bê neweyî
ev e name î halim!...

Arjen Arî

HERAKOL

li dengê nalan min dikir guhdarî
bin min re diçûn bi tîr û kevan peya, siwarî
ji artêşa talankeran bûn
bi dû qeranan de hêzên çekdarî...

şahînşah bûn, siltan bûn
alên wan de teyrêن nikil-xûn
şêrên dev-hêtûn di alên wan de
bin min re diçûn
bi xerc û bêş, fermanêن tacîdarî...

min, serî netewand li ber riman tu carî
bi ar-adaran rohnî
parastî bi mertalêن Medi
di êrîşan de Naram-Sin min dî
Sargon
û Îskender
û di tehtan de navek kolayî
yekî ecem bû Darayê dilber.

şop û şivîlê sedsalan de, di çiyan re wer
mîna teyrek baz bajen, mîna ber
di ber Gebarî re her,
û Cûdî bibîn, dûra li min biner

Herakol im ez, ez Herakol im
li jor im,
eniya xwe rak! hîn jî li jor im
li ser axekê -ku îro bindest-
ji doh de kefteleft
îro pîkol im!

ÇARÎN

axa sor-evîn xweziya jiya min
min xwîn dayê, wê nav daye min
pê hebûnim ez, bi wê ye paya min
bê Xweda dibim, bê ax û al, na!..

MASÎKO

masîkê'd nava qesê de asê mayî
masîko,
looo masî,
avên derdora Helebçe de bijiya
tê şêrîn bûya ev qasî?

reqên qeraxa behran bi xwedî ne
û ax berdane ji wan re, azad bûne.
çenek ax de biratî, kî navê
masîko,
kî navê bijî
bin ezmanekî de bi şahî?

Lê wer, bibîn
fetisandin di ava Mûnzir de biratî
Newala Qesaban de veşartî
lê mepirse;
binax kirine mirovahî...

dîsa jî
masîko, dîsa jî
li ber xwe bide.
bahrêن bê binî li hêviya te ne;
li pêşıya min e azadî.
û navê min Kurd e
masîko,
navê te, GAMASÎ

KURIK

ka goka te kurik?
xilçê xwe te li ku danî?
hevalên te li ku ne, koza karêن te kanî?
dê û bavê te, mamêن te?..
kurik, ka bêje çi bû?!
Ji Bosna-Licê yî tu,
ji Şirnex-Somalî?

xarêن te kê rijandin
kurik hêsrêن te ne li erdê?
kê tu berda kolanan, kê tu xist êşa şer de?
tiştêن weha Rom dikin,
kurik dev ji virrêن xwe berde!
Sirp hatibin heya vir,
kurik, Xirwatan girtibe ser we?..

navê te azad e, tu bixwe bindest î, kurik.
yê birayê te Welat e, tu bê welat î, kurik.
wer, xaniyekî em çêkin ji berêن êşen xwe, kurik.
deriyekî tê de vekin, ji hêviyên xwe, kurik.
pacê re ka binêre, tê bi ku de biçî?
ragir barê jiyanê, vir Kurdistan e, kurik!

TU SIMBÊLAN BADE

kurek min heye, welatgorî.
ez bêjim gulperî, tu bêje horî
qîzek min heye qîzek min;
kilambêj
û ...bejinçiya
ew jî here, dor tê min
dijmin,
tu simbêlan bade!

qedâ me
û bela me li serê te
zor im, mirina te me
bi dostayî jî heme bi neyarî jî
ez jî dimirim li vî çiyayî û tu jî
mirin ka li kê yad e?

Zor dişikê, terr ditewe
netewiyan gel, natewe...
dawiya vî şerî de zindiyek dimîne;
ew jî ev netew e!

tu simbêlan bade!

ÇARÎN

li ber munkir bersiv bide
ji te min kir û te neda
dil ji can ku ferza min da
ma te got qey tu Xweda yi?

NAME

şorbenîsk min ji bîr kir
tilîşewitî, hevrêşk û meyîr...
ji xweziya
tasek dims li ber min bûya
niha li vir...
lo esker çi dikir bela bikira!..

bi min re ma.
-newê gorê baş e-
hisreta qeraş aş e
ya min şal û şapik...
taldeya tehtek Gebar de niha
min pal dabûya
nanek tenûrê jî hebûya
azad bûma hê çêtir;
jixwe bindest im...

ez bêjim “têm çavêن te”
niha şil in...
û destên te binmil in, xwişka min
silavan ragihîn xwarziyê min
bêje, “xalê te diramûse,
têr têr tê eniya te-

û li ber mekeve
li ber min jî
ma ez xalê kê me?
ne... te digot, “çî mîr e!”
-berxê nêr ji bo kêr e-
êşa xwe mexe dilê xwe
sibehêkê rabe xwişka min,
bi ser wî bajarokî de bidêre...

birayê te...

NE AXPEREST IM

xwestibim zolek, teyarek
bi hed çend sed erd
çiyayêن têr devî, geliyêن bi kanî
tê de beriyêن bi adan, şen û har
ez lê birîndar, tu li ser mirî
hêlek qefalî, zozan
hêlek dojeh-deş, radestî ezman
serbilind, al, serbixwe
Dîcle tê de, Ferat tê de, Aqrî tê de
axek xwestibim di berê rojê de,
xwestime simbil û das
kulîlk û bihar,
xilç û zarok,
li ser darên wê cot-cot qumrî û kevok;
welatek xwestime.

mebêje: axperest e!
kalên min bi kevir û heste xwe spartibûn rojê
biratî xwestibin bo xwe û xelkê
û gotibin: dinya têra kê tune?
ka, zanibûn Mûsil li Mûsil, hasil li cih dimîne?

şivanekî biramîne:
pezê xwe nikaribe berde gelîyan
bizinêñ wî nikaribin raperikin devîyan
bilûra xwe azad nikaribe bikutîne
navê berxa xwe nikaribe deyne “şengilo”

ne ji tîrsa teba, ne ji xofa guriyên çiyê
zozanêñ wî lê qedexe bin
rê, rêçik lê birrîbin, pir xera kiribin
dor pêçabin, nikaribe bimîne şevînê
û bi jîmar bin di tûrikê wî de nanê sêlê, mewîjê Torê.
şivanekî biramîne:
ax lê fireh, ezman lê hatibe hev
axa xwe de bê ax, kerax be, tew!
biramîne, şivanekî:
navê wî bindesto!

ew şivan im
min ne bilûr e, min ne keriyê mîha ye
min ne gov e, min ne gund e, min ne warê bav û kala
ye
kundok dixwînin, bi dû de dengê sa ye
min gund berdaye, himî min berda, Xweda!
welatê min ji talankeran re maye...

hêviyek min maye.
hêviyek min, berxên Şengilo
min qir bike lo! min talan bike lo!
doh hebûme lo! Îro heme lo!
rûreşo, xwedî ço!
naqelim, naqelim lo!
ez ê sibê jî hehim, ez ê sibetir jî, lo lo!..

KULÎLKÊN BIHARA DERENGMAYÎ

her bihar vedibin di çiyan de
di aran de, zîndanan de
her vebûn, her vedibin
kulîlkên bihara derengmayî.

ne sosin e
ne nêrgiz e navê wan
navek din e navê kulîlkên nûgihayî:
di sojan de her bihar ji agir zayî
sor,
soring,
Medya...
vedibin li Herakol, vedibin li Gebar
her bihar
vedibin li çiyayê bêmiradmayî

bi xwîn bin, bi xwêdan bin
agir de qîçqîçî ger bi jan bin
Seîd e terhek wan, pelek wan Qadî ye
tu bîhn bikî hilma wan Dêrsimî ye
çar şaxan de berxwedan
vebûne Riza, vebûne Barzan, Mazlûm vebûne
her vebûnê de qir-qelanek jiye
li vî çiyayî... li wî çiyayî

û...

hilmek rizgarî ye maye li şûn wan
kulîlkên bihara derengmayî

li hêviya aran nemîn
kirasê tebaxê wergirtiye adarê, lewra
û çar dem veguhêrîne bihara Arya
her kulîlk canek gorîcan e anha
vedibin kesk-kesk
vedibin zer-zer, sor-sor vedibin
bi her vebûnê re dibizirin
û dişitilin di her dilop xwîn de
bi Medyayî

bîhn bik
hilmek azadî ye tê ji wan
kulîlkên bihara derengmayî

EV SIMBÊL

wan jî bi min re asaq dîtin
ta bi ta hatin kêşandin
û zîndan dîtin, razan bi min re
spî spî bûbin, nûha bi temen re
gava reş bûn tê bidîna
keçika cîranan dil ketibû wan
pêşîyan gotine, “qilocê mîran e”
tayên spî avêtibin wan jî
ev simbêl simbêlên mîrxasa ne

ev simbêl simbêlên mîrxasa ne
mîna Rizo min berdabin
Kurd in
mîna Simko min badane

BERF Û XOPANÎ

berfê, te bar li vir danî
li vî Cûdî l' vî Sîpanî
kuliyan bê pî û bê pahnî
lîstin xopanî xopanî...

berfê, tu berfa Serheda
ba li te da, kur li te da
tu bû lîstika qijk û gedâ
pal de xopanî xopanî...

rojê l' te da tu nehilî
xwe bernadî ji vî milî
bihar bê, bibarê şilî
şape xopanî xopanî...

berfê, berfa welatê min
rabe ji rê û latê min!
bighe şet û Feratê min;
bihil xopanî xopanî...

BANG

xwîn, xwîn!..

çiya xwîn, zîndan xwîn!
Sikak xwîn, bajar xwîn!
bi lîlîn dîsa dijîm
xwînrêj
xwînê bes birijîn!...

xwîna diya, xwîna bira
xwîna Amed, ya Çarçira
li nav ava, li binê pira
xwîn, xwîn!
neyê serê kafira!...

hooo biraaa!
vê xwînê qene
tu nerijîne, heyra!

EZ Û DIL, ÊVARÎ

li dû ewrekî bi bakur de derim
dem giran
hîzr biyan
êvar e...
bîstek din jovan ez ê vejerim
neçim û neyêm
ma çare?

te digot: dengbêj im, dilê min
ka bistrê!
bîhnek din hingorî ye
niha şebaka xwe vekiriye
tu nebilînî
ma çare?

mebêje, min çi kiriye?
wê hê kiriye, ho xwariye
û... êvar e
ez im yê roj lê diçe ava
her êvar ma ne tu yî
dilê min
bi min re yê bêçare?

bigihîstima stêrkan, baqek min didayê
ne dûr bûma ewsa û sînor nebûya...
bi êvarê re ta digire şeva min,
bayê evînê her min dilerizîne.
reşika çav rê natevsilîne,
çawakî bigihimê,
ew ê çawa bê rayê?...

SIBAT E, BÊHEDAR IM

dirêjî şevê bûm
neket mista min têhna lêvê
di devê min de maye
di nava diranên min de
qetek te
ji wê şevê...

hê min divê
hînî wê tahmê bûme
û elimîme têhna te
heyv sibat e
niha te sar e
bibûma lihêfa te

bi tenê me
tenê, bêhedar im
û bi xwe nikarim
şevek din salek e
tu baxilê veke
derî ez ê li dû xwe darim

ÇARÎN

hê doh qasid nişûv hatin
dest min şuştin ji zeriyê
lê dil ka ez bi çi bişom
ji evîn û vê hêviyê?

ÇARÎN

çavên min di hidûd de
du kanî ne li dû te
diherikin ji zû de
ava Bûnisra ez im

TOVREŞÊN IM

tovê jiyanê d' pêşmalka min de
tovreşên im li erdên beyar û kizir
ji axa xwe min çandibû ev bizar
ji axa xwe min hilanî
tovreşên im, tovê jiyanê direşênim
loma wisa rûmirov im, beşîşên im

pale me li palûteyên biratiyê
tasa ava min spartî bayê çiyê
ji kaniyên mirovahiyê, ji avsarkên beriyê
devê min de bêlûteyên azadiyê
loma Laleş im, loma geş im
şîn dike li axan seranser bizrê jiyê

xela cela bê, aşût bê, şapat bê
cêzên qûtê jiyê l' nik min lod lod in
xelkê bizrê zexeliyê difirotin
vekirî man sikrên Dîjle û Ferat
sebil, belaş diherikin mirovahiyê

bi çalepkan dimeşıya şarezatî, dest damê
tirabêlka riyên min de hînî tena bû
Anatolya wê gavê temengeda bû
qewm dihewandim, dahn didame wan
ezimandî-ne ezimandî
sifra min raxistî bû li ber mirovahiyê

rû nedabim êrîşkeran, keleşan, talankeran
ev dest in xwediyyê arê pîroz
siharê min de hilatine Newroz
tovreşen im, tovê jiyanê direşenim
xetên Simmeran de têm, diçenim azadiyê

KUTIK GOŞTÊ ŞIMA NÊWENO¹

mebêj, çilo?
mebêj, ci lo?
do bû hîna do
bi qûtê min re kidasa çilo
û werîsê min, warqîlên min
çarika jina min -dor bi morî ya bûkaniyê-
şewitandin tev li dar û deviyên çiyê

şewitandin,
şahid bûn car û cîran
şahid bûn kirîv, şahid bûn pismam
li talanên kê dixin, terşen kê dibin
mîrên min, axên min, kurên min...
cerdevano!
romo!
radesto!
hevalên Cemîlê Çeto!
li ber sêpiyê gelo
ew e gotiye xwe: ji kerê keto!

¹ Küçük goştê we naxwe

Ez ê celî bibim
ez ê bê rez, ez ê bê werz bimînim
kolanên bajarê biyan de jina min ku hûçik vegire
şevqa xwe de ez bigerim
Birho dimînim, Hemo dimînim, Şêxo dimînim
bela ji min re bibêjin, bi deriya keto!
Ji we re bela bimîne mezinahiya Cemîlê Çeto
gund ji we re
kund ji we re bela bimînin
hûn ê çiya çawa bi dest xin?
cerdevanno!
romno!
radestno!
navê we, no!
şopa we, no!
kûçikno!
kutik goştê şima nêweno

LI SER HELEBÇE

qut bûn ji biharek din
bi jînê şa nebûn,
hinek pûç bûn
di Helebçe de hinek kor...
hinarkên ruwa sor sor
ji heyva nîsanê nêrgiz
bilbizêq
û beybûn
tev... zarok bûn...

tev zarok bûn, tev de jin
bi jahra xerdelê mirî...
dilê min perçe perçe
dilê min parî parî
bi adarê re bihar digirî
li sikakên Helebçe

û ez
helbestkarek im di hêlekê de
birînên min Nagazakî
êşâ'm piç-piç Hiroşîma
bi dû ewrên jahrî tiştek nema
di Helebçe de ji nêrgiza
ji bilbizêqa
ji beybûna...

DÊRSIM DÊRSIM

her dever bi rizde û mirr, çiyayê Tûjik te dîtiye?
Dêrsim Dêrsim bilûran de êşa Dêrsim tebihîstiye?

vê bîharê xec venebûn, ji nefelê pel weriviye
lîlozan reng qet venedan, Mûnzir sor sor herikiye

gulan berî hezîranê d' gelian de şîn daniye
singoyê Rom de mendal im, biratî sor perpitiye

Rizê b' şaşik, Besa b' xeftan, Elişêrê m' nemiriye
raze Xerpût, nesûhire! sihara te têr sêpî ye

megrî Dêrsim, Dêrsim menal, xaka min şûnşahî ye
serhildan e, berxwedan e... mirin iro bi tilîlî ye.

adara ar û agiran Kawî, Qadî, Seîdî ye
çarde dem duwazde wext iro Zozan, Botan Dêrsimî ye

ÇALÊ Ü ÇAR ÇARÎN

Çal dibêjin, Çalê² bû
xal dibêjin li wê bû
nêzî Serê Kaniyê³ bû
Çalê Çalê gundê min

Çalê Çalê gundê min
lê man tirb û rezê min
cotê min, kesaxa min
qesra Silêman⁴ li wê bû

zilm dibêjin “lêlê” bû
perr û baskê me jê bû
gund nema vala nebû
Çalê ji welatê min...

gava bê vejerim li te
têr dixwim tiriyê te
doza min welatek e
ev der welatê kê bû...

² Çalê: Gundek li herêma Omeriya (ez bixwe ji wî gundi me.)

³ Serê Kaniyê: Li wê herêmê gundek bi av û şenahî.

⁴ Silêman: Axayê eşîra Omeriya.

PIÇEK MERHAMET

li vê dê
li va da
ji Gelîboluyê û bi wir vetir da
mêranî me şanî dijmin da!
ha bavê min ha!
li Çeneqelê li beriya Afyonê
“şerê rizgariyê” Memet kir, Hiso emir da!

kalê min lingek xwe da
-ji Çala Omeriya bû-
pismamê wî Ehmed, bêçeng mabû
digo: biratiyê destê me girêda
û misilmanetiyyê
“şerê rizgariyê” me kir, Memet giha azadiyê

di “Destana Şerê Rizgariyê” de Memet heye
Nazim jî pesnê Memet vedide:
-Mehmetçik Memet-
piçek merhamet!..
evqas mîrxasî evçend rûmet
hemû ya Memet e, Nazim Hîkmet?!

KÎ YE XWEDIYÊ VAN WARGEH Û VÎ WELATÎ

destên xwe di porê min re dibe, sir
roj, ramûsanan datîne hinarkên rûwê min
baskê pacê de çavan dinoqîne
sihar ji paxila min dertê bê pêjin

sira siharê de hilma axê divîbûm
beytik divîbûm, dîk divîbûm
û ew bîhna çilo!..
guhek min li dû bilûra şivê
bi dengê rojê hildiçenim, “looo
bajar e, birako!
sihara bajaran
naşibe xewn û xeyalên helbestkaran...”

min leyistibû li gasînên wê
bi xilçan, bi çavgirtînkê, bi çirrê
û berûyek min lê çandibû
Çalê gundek e, zaroktiya min de ma...

ving û vala ye niha
Cibiltînê, Xirbê Hinarê, Serê Kaniyê...
Cinata te Miho!
Silêman Çala te!
de... li xwe xe Sadûn
li ku ma axatiya te?..

ev tirî misebix e
rezvanê hoste kesax bikê
kî têr dibe ji tahmê...
ev kerkûş e
gûnroj e, libqurûş e
û ev mezrone
rûmeta rezvanê çiyê
tahmeke ji dîroka keda me...

hesk derketine ji destên me
kevçiyêñ darî, halet û gîsin...
kûra agir de hesin me hilandiye
ma ne karkerek me bû Kawa?
navbera her du ava li der û dorê
ev qesr, pir... avanî
hîmêñ paşerojê ne
da li ser bilind biba dahatû

mebêje, “çû, mede dû”
ji Newrozê şerm bik û
ji wî gîrrê xwe bi xwe yê bi rik
ev rik e... ev dahfik?!

veparime
û bipirse ji xwe
ka çi me?
bipirse
ka kî me?
û bipirse
yên ji dûr hatî
an ez im xwediyyê van wargeh
û vî welati?

ŞEVEKE HAVİNÎ STÊRK... Û WELATÊ MIN

ev Leylê ye, daye dû Mecnûn
ev Goşikê Tirî ye, ev Komika Sêwiyan
ezman de rêça ronahiyê ye
li cihê xwe maye işev dîsa Kadiz
nas in mîna cîranên taxekê
weke çira karkerên komirê
kit kit diçûrisin stêrkên ezmanê welatê min

kalên kalê min nav dane wan
yekê re gotine, Termê Merîxê
yekê re, Kerwankuj: bi serpêhatî
bê adar ma man bihar li vî welatî?
ev gel bê sersal, ev çiya bê ar?
li her bost ax li her qorzî-ezman
roj helatine, roj çûne ava
û navek li wî milkî kirine
jê re gotine “welatê Kurdan”

stêrkên bi nav hê jî diçûrisin
û axa bi berke hê jî ber dide
bi daristan û av xwe l' Hemedan dide
du hezar sal e arekî dadide
her li ber xwe da, hê li ber xwe dide
mêjok û dagirker da wê nemijin

ev Leylê ye, daye dû Mecnûn
dibêjim were, rûn
berê wê li çiyê ye...

ZAROKÊN ZERDEŞT

çend mirin di çeperan de?
Zilan de, di geliyê Soran de
ma refêن qulingan bûn
nîşangeha nêçirvanan di eniya wan de
ji hev belav nedibûn
tev kurêن min bûn
te bidîta
di himbêza axê de sor sor
dibeşîşîn

te yê bidîta.
ne roj ba;
kefa dest de ne weha deş...
te yê bidîta
raserî mirinê de egîdî
û
zarokên Zerdeşt
xwe nedan dest
bi Yezdan sondxwarî, ahddayêن Zerdeşt
her heşt, her heşt
di himbêza axê de sor sor
besişîn!

KARIBÎ WER VEMIRÎN!

cih li me niha çiya ne
cih li me niha
nefî
celî
penaberî...
ev qûça te!
Berberî sed berberî!..
arê tifika min doz biriye serî
qurmek din avêtime ser
ji bavê xwe de tu bêminet î
karibî wer vemirîn!..

yen devî nemîne bo şewtê li arê pîroz
yen kevir heste, yen qırşık pîso
ev beden ji ci re ne looo,
dagirkero!
pîso!
iblîso!
karibî wer vemirîn!..

BAZARA MIN Û KELEŞKOFÊ

min spart tahtekê
ne hewce, ne mahr-motac bûma
dişikandim anha!..

li dû rojê min rahiştiyê
min hijê nekir, lê belê
çiya ú bê wê?..

dêvla wê niha
serî min danîbûya çonga çemekî
li bilûrê bixista şivanekî
û azad bûma, tevlî axê...

ev semaxa ta kengî, dilê min?
kîsikê tütinê, şûtika min
rextê min, çefiya min
megazin
parîkî din, parîkî din
li ber xwe bidin
biharek tê!..

siharekê
-navê wê Newroz danîne-
roja ku dame dû, hiltê
ez ê te maçî kim
dûra, te dişikênim
ahd dame
keleşkofê!..

SIBAT E

nabêje serma ye, seqem e...
ma xem e rê hatibin girtin
kerwan herin, nerin
bûk bihemil bin, zaro nesax bin
ma xem e...
kirasê bûkanîyê li xwe girtiye Nemrûd
sibat e...

sibat e
bin konê mûyî de zivistan
egal xwar kiriye Qerejdaxê.
binpî jî be sipehî ye
li çiyayêñ welatê min ci tê
egîdî
û spî spî bûkanî...

te sar be
hûûû bike destêñ xwe germ bik
ezîzê ber dilê min, şervano
kebaniyê ça daniye ser
tifika me de her û wer
ar e
têhna zivistanî

xeynetî ji devê min dernakeve
ne ku çîrok bi tenê dibêje
dîrok ewsa dînivîse:
Kawayek hebû
roj bû, bû qırşikek canê me
ew ji destêne me hat, ji destêne me ew dibû
û me avêt ser arê heyî
ku ar
bû nasnava me

sibat e
çend hezar sal e, çend sed meh
nola biharî hê kêferat e
li her berqef
li her şikeft
û li neh sed û heft çiya
ku... ev ax
welat e?!

RAMÛSAN MIN VEŞARTIN LI GELIYEKÎ

ar girtiye qurm
û li dorê dileyize
çi kiribû
çi bû gunehê dara berû?
bi min re wê jî şer nexwestibû
bi min re zarokan, bi min re kulîlkê
û wê qîza xama...
ku, li dû min stûxwar ma
û bendî...

rondik herikîbin şer herikand
û xwîn pijiqand pelê kulîlkê
ma bayê kur rûxand hêlîna tivîlkê,
hij ma li milkê, ramûsan li milkê?

xwezî, lewitîn di kirêtiyê de
û şer dizî ji me xewnên mîrekî
li herêmekê em ji gundekî
dijmin jî bûna malê me pev dima
neyariya me nedigiha qewmekî
kengî bûya lev dihatin
em eydekê, erefatekê...

bi ya helbestê min kir
û min guh da bilûra şivên:
hij min aland li destmalek bi vê
û ramûsan min rakirin geliyekî...

ramûsan min veşartin li geliyekî
ew gelî yan ê Elî, yan jî li Cûdî
bi têhn dimînin li wir bi hij dimînin ramûsanên min
şer betal bibin, çek rawestin
ji çiyan şerker dadikevin
ez ê di nav wan de bim
ileh ileh, tu bê pêrgî min
da te himbêz bikim ji dêvla çiyê...

şer de ye mîna min niha helbest jî
kengî parzinîn biwêj ji xwînê
ji êşê rêz, ji şînê çarîn
helbesta min hingî bixwîn
wê evîn jê binizilê...

MIHEMEDO

kirasek berf im vê zivistanê
kûr-kûr dibarim li Dara Hênê
ewro vebe l' me, ezmano vebe
egîdek birîndar e li vê da hanê!

Mi
hee
mee
dooo!

vê da hanê pêşîra Pasûrê
qeşa girtiye, ba lê dizûrê
şivano! bişdîne têla tembûrê
Mihmedo bêje li wê da hanê

Mi
hee
mee
dooo!

vê da hanê dûr e ji wê de
vê de Gebar e ji min û Xwedê de...
Herakol e vir, wirtir Cûdî ye
şivano, derbê cihê xwe diye!

Mi
hee
mee
dooo!

vê da hanê qeraxa Mûnzir e
Dêrsim şahid e ku doz nemir e
xwîna herikî j' bîra kê dire...
Mihemedo bêje vê zivistanê

Mi
hee
mee
dooo!

Mihemedo egîdek bênav e
hijde salî de xortek berzave
bistire, Zozan bike serhawe
qaqebxo divê, lo law me dijmin diye!

KOÇERÊ

çenek din min vexwara...
dildarê kaniyê wê me,
der dibin ji tehta,
spî,
zelal,
qir qeşa,
qir-qeşa ye ava kaniyên welatê min...

ku asik diçêrin, kerî...
ref ref kew têne ser wan
û şivan li bilûrê dixe
bêrîvanî têhn, kerengvanî westiyayî
xwe berdidin dora wan...

te, pûng diye.
nedîbe, te bihîstiye...
ya, navê kevzê
keçikekê çîzmazk daye hev
yeka din ji tolikê tê
xortekî pişt daye tehtê
evîndar,
qîr dike, “koçerêê!”

koçerê,
bi te re koçer bûma!
bi te re têr bûma, birçî bûma
girtî bûma, kuştî bûma...
li van axan, koçerê lêêê
bela ne penaber bûma!

KIRÎVÊ KÊVO⁵

Dêrik e, xwes Dêrik e⁶
ji Kevirşînê⁷ xuya dike Dêra Metîna⁸
bi me man dahlên zeytûna.
titûna min diqediya, min jê deyn dikir
me li hev bida bi kevir û bivir
Xweda jê razî,
em î cîran bûn.

qibla me ne yek bû:
berê min li Mihemed bû,
yê wî li Îsa
me qîz nedan hev, lê belê dîsa
Xweda zane ku,
em kirîvan bûn.

sersebebno, mala we hilweş!
û ya we fitnekaran
û ya we çavnebaran...
misilmantî ev bû?
kesekî navcîtî nekir:
-yabo ferman e-
ne deynekî me li hev bû
ne xwînek, ne sersinorek..
kirîvê min di qeflê de çû!

⁵ Navekî mîran bi Ermenki

⁶ Dêrika Çiyayê Mazî

⁷ Gundekî Metîniyan

⁸ Li herêma Metînan gundekî kevnare

li wî gelî, pepûkê xwend...û xwend!
kê da, kê kir ew fermana gewend?
van rêyan dît: şikestin... û çûn
û em kurdêñ misilman bûn.
kirîvantî li nik me nan bû:
bide xatirê xizaniyê
kirîvo em nezan bûn!

PIRS HENE ZANIM

kulîlkekê dirêjî min bik
te kulîlk nebe, ramûsanekê
ramûsanekê
ji hinarkan
an
ji lêvên qeresî!

girtî me
li dûr
û hepsî
serdana min î û tu tê
û ramûsanekê nikarim bistênim
heyfa salan hiltênim
deyndara min be
û wer bihêle
hinarkên gewezi!

ileh, distênim
qîma xwe tênim, carek din...
serdanek din,
-hê bi rê neketî, hê li malê-
bipêçe ramûsana
ji min re, li destmalê

pirs hene zanim
û zanim Xurs vala ye
te saxtî dikin bi rê de
bindestî di gewriya te de ta ye
û li min jî bela ye
umrek e, me daye
evînek e
ma hewceyî şahida ye?

BI ZERIYEKÊ RE BAZAR

azadî gotibim û bilandibim,
nexwestime ji xwe bi tenê re, xanim!
ne ji bo soringa lêvên te lêvandime:
bi xwe re ji kêzikan re
ji sîha dara berû re, xwestime
û pê re
ji axekê re canim!

-jixwe dihejin /û diherin /û diwerin
di binkirask de memikên te!-

azadî roj û bahr e, bi te
ji min re mirr e, xanim!
ne kêm ne zêde
azadiyekê divim canim
te bivê bide min di ser re
minêkar im;
cotê memikan
û
xwe!

DU DAREŞ

ba dijendin li balahiya
li valahiya li spîtiya
difirîn
û
dikenîn...
li lûtkê çiyayekî danîn
du dareş:
qer î qer!
reşahî
ji wan şîqiya

şahid tune, ku westiyabin ji firê.
li ser vê axê j' beriya berê
di direfşekê de erê, hejiyan!
Piştre, destên peykervan
û kedê,
li dû xezwekê
ew kolan
û man
li ser hêtêneş î kevir
mohr in,
ji tacîdariyekê man.

du dareş,
ku te nedîbin bi du çava
dakeve Deriyê Çiyê
tê bibînê li wê
hêtêneş î kevir de
mohr in hê, li Amediya

JI BÎR NEBÛBE

zik î ziwa
dûrketinek im ji wê
navê wê
dibe ku Bedo be
dibe ku Indeko be...
qutbûnek im jê
û
ji silava...

miçiqîbin kaniyên çava
li rû megere li şopa êşê;
daketibe kezebê
xwe berdabe hinava...

çil sal e va!
nebûbe,
ji bîr nebûbe
Bedo be ew Hewwa?!

TAA FERWERDÎNEK DIN

ramûsanan rêz bikim li gerdena te morî-morî
dûra te himbêz bikim, te...
binêr, ferwerdîn hat û buhurî li min û te
û berê me li payîza u' mr e
temen di biharê de xweş e, evîn di biharê de...

hij te kiribim
şewitîbim li ser te, peritîbim parî-parî
bihêl, sayêن xewrevêن bela bikin zûrîn
kundokêن sewthejar bela bixwînin şevê
gund dihise, bajar dibihîze
daxuyaniya evînê me, li devê derî

pêdikevin çirayêن korik
pê re ewan-ewan dertêن kolanan rohniyêن mirî
dest pê dike kurtepistî, çavnebarî
ketibî ser ziman tu bi Zînî
û Memê te ez bim heke
şerm meke
veke deriyê dubask
paxila xasxask li min veke
û piştekê bide pişt derî
taa ferwerdînek din vem-meke!

MEGRÎ

çenga por bibin bibin
bibin ser gorên dil kuştibin
bibin bin konên şîn girtibin
megrî çav-deryayê megrî
mijankê te ji kil dibin
megrî por-roavayê megrî
megrî û meke, li min li min!

hijê bike rê û bimeşe
xwe l' çiya bigre û bimeşe
emrê te hê çend û şeş e...
megrî meke, li min li min!
megrî, bikene li dû min
beşîşînê bike rû min
şehîdê dilê te ez bim
mekenîne bi me, dijmin!

DAWETA ME BÛBA VÊ BIHARÊ LI VAN ERDA

behîv bişkivîn, pêşî
dû re, biharxêrê serî hilda
dar û ber ketine kulilka
pirr nema li van erda
ji biharê re pirr nema

mîhên zayî cot anî ne
spî spî, belek belekî
berxikêñ nêr û mî
di çêrê de ne li dû makê
roj hatiye hatiye, ketiye şibakê
tê bibêjî ji tirsan xwe daye alî
ji vî alî, ji wî alî
piling dadaye sermê!

yê ba dikeve, pêşî
û dûre yê avê...
berberoşkê camiyê bi têhn e
bîhna nanê tenûrê jê tê
tu nabê, li ser milê yara min e
berê wê li min e
ji wir ve tê...

tê vî alî yek, yek diçelqe bi wir ve
paşıya wê li min e
dixwazim herim bi dû de
nanê tenûrê bikim mahne
kaaa ka!
zaroyê apê li dû ne...

behîv bîşkivîn, pêşî
dûra biharxêrê serî hilda!
ew yar min bixwesta
daweta me bûba
vê biharê
li van erda!..

XWERÛ BIHAREK E SERHILDANAÊŞA MIN

xwerrû biharek e serhildana êşa min,
van wexta
li çiya arek e
loma dil ketime azadiyê
diya min got, dil mediyê!
dil e, ma naxwe?
pî dame piyê çiyê

hij axê dikim mîna gulek pêxemberî
her roj bîhn dikim
û pê re radizêm, radibim pê re
silav şandime ji mirinê re
bê... bela bi dijminahî bê
ne bi xwelîserî!

tirsa min bêbextî ye:
piştî şîvek xweş
piştî çayek giran...
çeka xwe spartime Sîpan,
keserek e di gewriya min de hingorî:
yarê şandiye bi qasid re
gotiye, hijê dikim
ma ez nakim?!
ma bi min dikeve
xwelîserî!

xwerrû biharek e serhildana evîna min;
her wext
li çiya arek e
min dil daye azadiyê
diya min got, dil mediyê
looo,
ma ev jî bazarek e?!

NOŞİN BE

sê kaseyê qahfikî werîne
hebe li ba te şeraba Asûriyan
şerbikekî ji me re derxîne!
kaseyekê li ber min
yekê li ber xwe
meyger, ya din
li ber Fehmiyê Bîlal deyne!

vexwe mamo!
vexwe, ez xulamo
îro ïd e!
îro salvegera serhildana Seîd e.
noşin be!

MIRINÊ, TU BI XÊR BÊ!

ev pel yên dara berû ne,
tevlî hêsrên pîrekê bûne li vê qeraxê
ev zinar perçe perçe ye bi derbê
ev gund vala ye, ev kanî çikandine...
zilm ne ev e tu û Xwedê?!

tu û Xwedê, nêrgizê çi kiribû?
şalûl çi kiribû, endelî çi kiribû?
çûkê beytik hê nû pûş biribû
gunehê wê çi bû vê êvarê?

hijêkirinek be jiyan li ví milkî
ji felqê safî dildariyek e ya me
her û wer li oxirê giyanek e
-ha iro, ha sibe-
mirinê tu bi xêr bê!

em xwedî ne
û em in hevîrtirşê semaxê
navê çêleka min qemerê ye
yê golika wê, beşo
dused sal e li vê axê
dijmin min qir dike, qaşo!

HÊ ŞER E LI WÎ MILÎ

ji vî milî rabûn
ji ser darêن vî gelî
qumrî pev re firîn
û kevok çûne gilî
quling koç î koçber in
û çivîk li vî milî:
ev mil milkek e
milkek
wêran e anha!

Ev mil milkek e, wêran e anha
li xweza ferman e, li me ferman e anha!
Ne çêre ma û çara me nema
miriyêن xwe me hiştin, em hatin vî milî!

miriyêن xwe mehiştin, hêşir me neanîn
êşên xwe me tev kuştin, li ber kêlan me danîn
li ferhengê'm rûniştin, du pevv me jê deranîn:
yek jê berxwedan e, serhildan ya duyemîn
me anîn her du bêje bi xwe re ji wî milî

ew mil milkek e,
ku talan-wêran e anha!
kêzika geh berdane
kurmik li derya ne anha!
koçberî têkçûn e, mirin jiyan e anha
anha berxwedan e, hê şer e li wî milî...

LI SER XEWNEKÊ

def e
bi zirne dîlan e
xwe berdane ji çiyê
rext danîne tiving hildane
ketine govendê şerkerên azadiyê!

di nav me de ne
rû-qemirî
birûmet
navê wan ji devê me ket?
navê wan Serfiraz,
Aştîxwaz,
Sermed...
yeko yeko lehengên azadiyê!

bilîlinin, xêlîno!
xelkino werin şahiyê!
def e
û zirne "Zozan" dibêje,
azadî bû ma ne, ya em li hêviyê?

AXA MIN

axa min, axa min
axîn û deyaxa min
kaniyêñ te çikiyabin
va xwîna min, xwîna min
diherike, ez bi gorî.

loma tu gewez û sor î
mîna kulîlkêñ Gebarî
Newroza pîroz û adar î
roja siharî, êvarî
axa min, axîna min
birîn û nalîna min
hêlana min, hêlîna min
ya ku navê xwe daye min
axa min, jînistanê
Kurdistanê ez bi gorî

azadiyê dikim morî
ristik-ristik bi ta vedikim
bi gerdena te ve dikim
axa min, axîna min,
nêzîk, siharek bihariî

WEY GIDÎ

min dil daye mewîjka çavêن te
ka guneh e?
mijgulin te hene mijgulin te
reş... û bi ser de kilkirî!
hewce ye bibêjim birhêن rakirî?
Porê vekirî, pêşîrêن berd î berr!..
wey gidî!
bûme hêşîrê te!

ÇARÎNÊN HEWADÊR

qulingê baskşikestî ye dilê min
ji bin milê çepê birîn-xedar!
Evdalo, kê li me neda tivingê?
ne ez têr geriyam, ne te têr ax xwar!...

SIBE NEWROZ E

hêvî ne libên tizbeha min
ta, ji sebrê semax e
qutiya min mişt titûna qaçax e
bîhna Helhelê jê
diçe û tê
û difûre bi qevzên min re li hepsê
sibê seredana min tê
qewîtiya nêrgizekê kirime
û gotime bîne
hûçkên kirasê xwe de
kevir
pîşo
û heste!

sibe Newroz e!

**JI ÇAPEMENIYÊ ÇEND RÛPELÊN LI SER
ARJEN ARÎ**



Arjen Arî
(1956 – 2012)

HÊVÎ HAWAR Û NASNAMEYA XAKEKÊ: ŞÊRGELE⁹

Berken Bereh

Li qonaxeke dijwar; ku ziman û çand û kultura Kurdî tune dihate hisabikirin û bi kurmancîaxaftin yek ji nişaneyâ gundîtî û dûr-şaristanî dihate zanîn, wî û çend hevalên xwe (Rojen Barnas, Berken Bereh, Mem Ronga) dabûn ser şopa bav û kalên xwe û wek Donkîşotê Sirvantêş sînga xwe vekiribûn ji tîrên xérnexwazan re. Di mîjiyê wan de xewn û xeyalên dahatûyeke gewre, di dilê wan de baweriya wan, li ser zimanê wan peyvîn Kurmanciya reş, di destê wan de pertûkên E. Xanî, M. Cizîrî, Cegerxwîn... berê xwe dan tîrêja spêdê. Li wan salên awarte û dijwar, bager û bahozên înkariyê ci biketa li ber wan diqutifandin. Lê wan tucarî ne bejna xwe tewand, ne li paş xwe nihêrîn û ne jî ji ya xwe hatin xwar. Wek dînemêran her li pêş, bi hesreta weliteke azad û dînyayeke xweşiktir meşîyan. Li kod û şifreyên di bîrên bê binî de hatine veşartin, li lûtke û berqafêñ ciyan de hatine binaxkirin digerîyan, da ku xwe bigihînin wî warê wê her kes lê bi biratî û wekheviyê bijîn. Arjen Arî, di nav wî refê dilpiyar, henûn, berxwedêr û raperîner de, yek ji wan ê herî li pêş bû.

Helbesta Arjen Arî, ji “Ramûsan Min Veşartin Li Geliyeki” ta “Şêrgele”yê her bi heman şewaz û vegotinê

⁹ Malpera Diyarnama, 20.06.2008
<http://www.diyarname.com/niviskar.asp?Idx=285>

bala mirov dikêşê. Ev vegotin wek ferhenga wî bi teql, çiyayî û nêr û berxwedêr bûye. Tirajediya bi sedan salan ya li vê xakê hatiye jiýin wek tevnkarekê bi sebr û hostatî vedibêje û digihîne îro. Helbestên wî, wek manîfestoya pêşmergeyekî ku dikare li her derê olan bide û bête jiberkirin, xwe berdide nav dil û hinavan. Vêya jî wek ahenga dengê qoça şal-şapikê bi hêmînî û bi harmoniyê pêk tîne. Gelek caran em wî dibînin, li lütkeyên Cûdî li kêlek pezkûvî û karxezalên sîng-sor, carna jî li nav xirûcira Ofisa Amedê wek derwêşê Kurmanciyê, banga lixwemikurhatinê û mizginîya dahatûyeke gewre belav dike, direşîne.

*dem spî, aso spî, ba guzan
ev gelî Geliyê Zîlan
di çend kêjan werbûm û rabûm
tev de tev de 29 bûm
navekî min bû şikestin, navê din bû serhildan!*

Li vir pirsgirêk bidestxistina serdestiya dil e. Ji ber vê hindê carinan kewara hiş û mêtî bi helbestên Cigerxwîn dadigre û bi vê re jî di zeviya peyrevêن xwe de dest bi çandina tovê helbesta xwe dike. Bi demê re helbestine ku wek oratoryoyê bêne gotin zeft dike.

*ewr spî ezman spî erd spî
ba şûm, bahoz dîn-dînoke
çar rê kor in, çar dor sik i spî
û çar hêl çarmedor, heta noqê d'berfê de!*

Wexta em bûn serdestê dil hingê em dikarin zemanî, cihûwarî, hemû kêlikên jiyanê zeft bikin. Lewre em dijin da ku bersivine bibînin ji bo armanc û heyîna xwe ya li vê dinyayê. An wê tucarî emê nekarin ji “welatê nefiyê” vegerin “serbajarê serbajaran”. Ji ber vê ye ku di helbesta Arjen Arî de hawara Kurmanciyê dibiriqe, trajediya Kurdan a sedî salan olan dide. Helbestê wî dişibe rep repa lingên leşkerê ordiyekê. Dema tê xwendin dîmenên ordiyeyeke dimeşê tê nîgaşkirin.

*di binê aşûteke xezeb-spî de man
an çûn li ber pêlên aveke tezî?
xwezi ez miribûma, û hew bû!
Newal bê guh diman... û şer bû!
Çiya bê ser diman... û şer bû!
şev serjê bû bi ser rojê de...û şer bû!
şer bû...
şer bû...
şer bû...
mirinê serê xwe çimand li ber mirina wan
şêrgele hebûn: şér i şervan
û xewna wan xewna her kesî!*

Ew dengê bi efsûn yê helbestê wek sûlavekê bi xumexum diherike. Ew ked û xebata şev û rojan aşkere dixweye di wan de, bêhn û rengê iroj tê de diçirûse. Sebr û mecalâ tîrêja spêdeyê ku lütkeyên Herekolê dialêsin dixweyê. Xwe bi ayetên E. Xanî ku ruknê neteweperiya Kurdî ne têr dike, tasek ji helbesta M. Cizîrî ya di tahma “işq”de ye vedixwe û şûr û mertalê

Feqiyê Teyran û demançeya Kurmancî ya Cigerxwîn davê ser milê xwe û serî hildide li hember şaristaniya qaşo hemdem.

*şa'ir im; qereçiyê pesnê çavên te
li dabaşa nevê te hevdengê Evdal
şûm im hebekî, hinekî zirz
min ji Xanî bipirs, min ji Hejar
min ji Mella, min ji Hêmin, min ji Dildar
sirûd Ey Reqîb im, pêñûs ey reqîb!*

Bi her ristê hûn bi xwe ewle û bi bawer dibin. Wek çinarekê xwe digihînin rehen xwe yên hezar-sale. Îdî navê hemû demsalan bihar û hemû qonaxên dîrokê serhildêrî, berxwedêrî ye. Îdî heyam heyama jixwebawerkirinê, heyama têkoşeriyyê ye.

*wê vebe rengo rengo
li dû taveke xwêjinkî, keskesor
sihareke rûbihar e hêviya min
tîrêj-bisirîn rojeke gulî-sor
ha hilat ha hiltê*

Arjen Arî dildareke jidil ê kûlîlkane, ev kulîlk her çiqas gellek caran wek metaforekê di helbesta xwe de bi cih bike jî, em aşkere dibînin ku rasterast bi bêhn, bi bejnûbal û bi rengên wan hatine vegotin. Wek; xec, lîloz, binefş....sor, qurmiz...

*ez ê li çiyayekî bikim navê yeke
tu navê qîzekê bigore, bike Beybûn*

*pel pel hebûn, sor sor serxwebûn
kulîlkan çil kezî bi ser kê de birîn?*

Di helbesta wî de em rastî hawreke sotiner têن. Ev qêrîn û hawar ne biyane, lê ne ya axeke bi sînor e. Gellek caran şaxên wê ji vê erdnigariyê digihêن ta ber ersa Xwedê. Car zêmar, car têkoşer, car mersiyeyeke ku xweşik, spehî û narîne. Her peyv wek ritm û awaza dilê wî diherikin li newal, gelî û germiyanan. Zû konê xwe vedidin û têن jiberkirin. Newa di tahma sirûdan de ye. Bi van taybetiyêن xwe, em dikarin bibêjin “Şêrgele” hawar û ûmîd û nasnama vê xakêye.

Nîşe: hemû helbest ji ‘Şêrgele’yê hatine girtin.

EM JI TE HEZ DIKIN ARJEN ARÎ¹⁰

Karwan Koçer

xema çûna te ji dil giryandim
helbesta evîn di can wejandim
mamostayê min Arjen Arî
bejna evînê bê te tevizî
rondikê pexşan bo te lerizî
wêjeya Kurdî ma rût u tazî
mamostayê min Arjen Arî
ramûsan weşart te li gelîyekî*
çiyayê rûsipî* der kir kanîyek
Destana Kawa* got te ji nevîyek
mamosteyê min Arjen Arî
ez bûm bîhoka pişa sînoran*
gorî u bindest* ji dest nemêran
pistî te ez bûm gula be‘ivan*
mamostayê min Arjen Arî
çil çarînê* te dixwînim çil car
her car çil carî ji dil tê hewar
sor gulê baxan çîma dîkin bar
mamostayê min Arjen Arî
şêr ma bê gel û gel maye bê şêr*
mîrê helbestê oxir be, bi xêr
dil û çavê me ji te nebûn têr
mamostayê min Arjen Arî

¹⁰ Malpera Kurdîgeh 03. 11. 2012

<http://www.kurdîgeh.com/details.aspx?an=344>

* Navê kitêba mamoste Arjen Arîyî



(Hesen Silîvanî - Çilîniya Arjen Arî, Duhok)

NIVÎSER ÇIRAYÊN HILIN NAVEMIRIN¹²

Komeleya Nivîskarên Kurd – Duhok

Çilîniya helbestvanê Kurd Arjen Arî iro li Yekitiya Nivîskarên Kurd-Duhok hat saxkirin û tê de çend peyv û pexşan û çalakî hatine xwendin û numayışkirin.

Çilîniya Arjen ev demek bû Yekîtiya Nivîserên Kurd-Duhok amadekarî ji bo dikirin û iro 12.12.2013 bi çend rê û resman saxkirin.

Li peyva vekirinê Beşîr Mizûrî bixêrhatina mîvanan kir û kurtiyek ji jiyan û berhemên helbestvan Arjen Arî bo amadebûyan da diyarkirin. Li dûv re Mihemed Ebdulle peyva Yekîtiya Nivîserên Kurd-Duhok xwendin ku wî jî ew rola Arjen Arî û peywendiyêñ wî

¹² Malpera Komeleya Nivîskarên Kurd – Duhok, 12.12.2012,
<http://www.duhokwriters.com/latini/in.php?page=news2&id=1168>

li gel nivîserên rojava û danana bingehê evan piran li gel wan ya diyar û girîng bû.

Her wisa da xuyakirin ku nivîserên Kurd her dem dê di bîrdanka miletê xwe de zindî bin ji ber wê renc û xebata wan kirî û wan berhemên wan yên ku vê ramanê digehînin. Li dûv de serokê Yekîtiya Nivîserên Kurd-Duhok Hesen Silêvanî kurte helbesteke pexşankî diyarı giyanê Arjen Arî kir û tê da bal kişande ser wan rojêñ ku wî bi Arjen re buhurandibûn û wan axaftinêñ di navbera wan de bûye û wan xewnêñ wan ji bo dewlet û serxwebûna welatî û dana mizgîniyê ji bo Ehmedê Xanî...

Her wisa helbestvan Selam Balayî jî helbestek bi vê helkeftê nivîsîbû û ew helbest her di roja wexera Arjen de hatibû nivîsin, li dema ku ew digel şandê nivîseran çûbûne Amedê ji bo besdarîkirin di rê û resmên veşartina helbestvan Arjen Arî de.

Her wisa birûskek ji binemala Arjenî hatibû û ew jî tê de hate xwendin. Dîsan birûskek ji aliyê nivîser Tengezarê Marînî û Yekîtiya Nivîsarên Kurd-Rojava hatine xwendin.

Ji aliyekî dî ve çend helbestên Arjen Arî bi dengê wî bi xwe bi rêka data bû hatine nîşandan. Li dûmahiyê kurtesemînarek li dor berhemên Arjen Arî ji aliyê nivîser Berken Bereh ve hate pêşkêşkirin û di dûv de Kalê Qurdîsî çend bîranînêñ xwe digel Arjenî vegotin.

SILAV LI TE BIN ÇIYAYÊ RÛ SPÎ ARJENO¹³

Hesen Silêvanî

Silav li te bin çiyayê rûspî Arjeno
Evîndar û şergeleyo
Îro jî: Jiyan çiya ye, hêvî çiya ye
Hoo hevalo, helbestvano
Ev e peyvên te ne dibiriqin mîna bişkurîna te
Ya çi caran ji ser û çavêne te bar ne kîrin:
Gelek caran min xwast ez herim çiyê!! Min dixwest ez
herim, rasterast jiyana wan mirovan bi çavê serê xwe
bibînim, bi wan re bijîm, nebû qismet.
Silav li te bin Arjeno,
Silav li te bin xwedanê peyvên viyan û berxwedanê
Silav li te bin xwediyyê sunda xwe:
Sundek min hebû, min gotibû, ez ê ji vî welatî neçim
Û tu neçûyî û te sunda xwe parast hevalo... Arjeno
Û pora te ya qijavijî û simbêlên te yên boq, bi azadî axa
Amedê maçî kirin
Ew Ameda tu bûyî yek ji sîmayêne wê
Mîna şurihê, mîna deriyêne wê.
Û heval û hogirêne te
Zerî û evîndarêne te
Li te xwedî derketin hevalo.
Hevalo Arjeno

¹³ Malpera Komeleya Niviskarêne Kurd – Duhok, 12.12.2012,
<http://www.duhokwriters.com/latini/in.php?page=kotar&id=1045>

Were da careka dî van çar malikên te, li ber bayê azadiyê û tembûra Îzedîn Temoyî, li baxçê nivîseran, bo stêrên sema xweş kirin, dîsan bibêjin:

*Ez ê li çiyayekî bikim navê yeke
Tu navê qîzekê bigihure bike beybûn
Pel pel hebûn, sor sor serxwebûn
Kulîlkan çil kezî bi ser kê de birîn??*

Erê hevalo, serxwebûn, serxwebûn, serxwebûn
û çi dî ne ji bilî serxwebûn!!

Çi neqîşê li beraya ev gotina te Arjeno:

Jiyan kêlîkeke, tiştê ku îro bê kirin, min nexwestiye ez
îro bikim, ji bo min sibe tune!!!!

Erê keku, heke me îro serxwebûn nexwest, pa kenikî
emê bixwazîn?? Heta kengî em bi şerm li ber destê
Xanî rawestîn?? Kengî dê mizgîniya wî viyay, gehînin
destî???

Serxwebûn, serxwebûn!! û çi dî ne ji bilî serxwebûn!!
Arjeno, rûgeşoo, xwînşirîno, ka ew ramûsan? Te li
kîjan gelî veşartin??? Çima te veşartin??

Çi nemaye ev bihar dê bi xeml û gulên xwe ve were û
qîzêñ Omeriyan dê ramûsanê te aşkira kin û ji nû li
dol, newal, deşt û çiyan çînin ve!!! û bi rundikên evînê
avdin ve.

Arjeno çavbikenîyo, çend bi ruh sivkî te digote hevalên
xwe:

Bi Xwedê kêfa min ji mezinatîyê ra nayê, gurî min
mezinatî ne ew e ku tu li ser kursiyekê li jor bî, li gurî
min, mezinahî ew e ku tu di dilê xwe de nefş biçûk bî û
kirinê te mezin bin. Kurd sibe tiştékî mezin bidin

min jî ez ê bêjim: Heyran li min bibûrin, bi kêrî min nayê.

Heyran, ka were careka dî bi peyva ez heyran, civata me geş bike.

Bejindelalo Arjeno

Evîndarê deşt, mîrg û çiyanoo.. Arjeno

Hey dînukeyê cîhana helbestê Arjeno

Te bi hemî bawerî digot:

Nivîskarî dana Xwedê ye

Û te Bavê Nazê jî dikir şahidê gotina xwe Arjeno

Were Arjeno da bi deh malikên helbesta te ya wek te bi hêvî, xatirê ji civata ji bo rêzgirtin û mezinahiya qelemê te amadebûn, xatirî bixwazin:

Hêleke min diqutufe ji serme

Çiya keleheke asê. Dem asê

Hêviya min kulîlka binê berfê

Ha pel bû, ha pel dibe

û berî tê

Tê

tê...

Bibare berfê

Li ber xwe bide kulîlkê

Tu ji vê axê yî, ez ji vê axê!!

Silav li te bin şérgeleyo, Arjeno, neviyê şêrikelayo!!

